Heyva Avdarê, heyva şîn û şahiyê xatir xwest

Kobaniyê:

*- Li 12 û 16 î heyvê, gelê me yê Kurd li gund û bajarê Kobaniyê, bi hezaran derketin şar û kastînan, pênc deqan bêdeng û bi awakî şaristanî û aştiyane rawestîn . Di wê seknandinê de, pakrawanên Kurd yên bûyera 12 î Avdara 2004an ya kambax ku, li herêmên Kurd, li Sûriyê serpêhatiye, di gel şehîdên Helepçe bi bîra xwe û gel anîn.

*- Li 21an jî , bi dehezaran gelê me yê Kurd li Kobaniya delal, di xwerista rengîn û xweşik de, li ber dengê awaz û stiranên folklorî û netewî û reqis û seman yên deşta Sirûcê, NEWROZA xwe xemilandin û bi kêf û şahî derbas kirin .

Digel nivîsandina gotina serokmarê Sûriyê bi xêzeke reş û qaling li ser şanogehê" Gelê Kurd pareke ji tevna civaka nîştimanî ya Sûriyê ye".

Reqê û Girêsipî :

*- Herweha li wir jî, di 12 û 16 an de, gelê me yê Kurd , şehîdên herdû bûyeran bi rengekî şaristanî di

wê seknandinê de, bi bîra xwe anîn . Û ew destên şoven û qirêj ku, bûne sersedema wê xwînrêtinê şermezar kirin .

*- Di 21an de jî, weke hemî cihên dî , bi hezaran derhatin çolê, bi çepik , dîlan, stiran û kêf û xweşî ew roja aştî , wekhevî û azadiyê derbaskirin . Hêja ye jî, em wînin zimên ku, dora şanogehê bi sirûda (bijî biratiya Kurd û Ereban , bijî NWEROZ şana aştî û azadiyê û em tev de di vî welatî de hevpişk in) hatibû pêçandin û ala Sûriyê bi ser de hatibû daleqandin . Ji bîr nebe jî, beşdariya hin kesan, ji hin hêzên Ereb yên dostê gel û doza Kurd li Sûriyê , di gel gotinên pîrozbahiyê yên wan ji gelê Kurd re pêşkêşkiribûn.

Heleb :

Bajarê diwam di Sûriyê de, bajarê yekem ku bêtirîn Kurd lê dijîn .

*- Li 12 î Avdarê bi hezaran xelkê me yê Kurd li taxa Eşrefiyê , Çiyayê Seydo (Şêx Meqsûd) , Bistan Başa û li kastîna zanîngeha Helebê jî xwendekarên Kurd "5" deqan bêdeng man. Di bêdengiyê de , xwîna di wê rojê de hatiye rêtin bi bîranîn. Lê, li gel wê , di rûyê wan de, hertiştê bi azadî , aştî û wekheviyê ve girêdayî diyar dibû.

*- Li 16an jî , dîsa weke hersal û bi sêçar caran ji roja (12) an bêtir û li ciyên berê , gelê me yê Kurd li hev kombûn û (5) deqan sekinîn . Û bi bêdengî Helbçe bi bîra xwe tanîn , biratiya xwe ya netewî jî diyardikirin û digotin na şofînîzmê re, na ji quretî û nakokiya gelan re, na ji bindestiyê re, na ji qirkirinê re, na ji qedexekirina zimanan re û erê ji azadî , Aştî û wekheviya gelan re. Herweha meşek aştiyane (bi qaserî 2000 ta 3000 kes)

→→